

Dua, tazî û kombûnên civakiyên din di dema Koronayê, COVID-19

Vîrûsa Koronayê pir vegir e. Dinya dê niha pandemiya gerdûnî tecrûbe dike ku bandor li her warên jiyana mirovan dike, di nav de, dua, kombûna civakî û dema xwarinê jibo betlaniyên girîng ên olî, nerîtên binerdkirinê, tazî û xemgîniyê di her olê de.

Hûn di civata xwe de pisporin û çêtirîn dizanin ka çawa guhartina bi cîkî çê bikin. Li vir rêbernameyek heye jibo axaftin di derbarê dua, tazî û kombûnên civakî di vê demê de:

- Nerîteka civakî ya rojane çêbikin da ku nîşan bide kû hemî endamên civakê dikarin bi ewlehî beşdar bibin. Wekî mînak, li hin cihan di demek diyarkirî a rojê de, peyameka yêketî yê ji aliyê milletê re bi hev re tê gotin, dema ku bi amêrên din dengedeng dikin. Ev jî hestek civakî diafirîne, herçend ku em nikaribin jî bi awayek fîzîkî ji nêzî hevûdu bin.
- Heke hûn saxlem in û tu kes le mala we de nexweş nine, hûn dikarin di vê demê de ji pêşkêşkirina çalakîyên xêrxweziyê domdar bimînin. Hetmen ji her kes ku di mala we de namîne, 2 metre dûr bimînin.
- gelek ol, kombûna civakî û xwarinê ya birêkûpêkî hene wekî şikandina rojî di deme ramazan û şîvê şebatê de. Di dema pandemiya heyî ya gerdûnî ya Koronayê, ev çalakîyan divê tenê bi kesên ku di nav malê we de dijîn, werin berdewam kirin. Civînen civakî yên mezntir dikarin bibin sedema belavbûna vîrûsê di civata we de. Ev li hin welatan qewimiye.
- Nerîtên binerdkirinê pir girîng in jibo her civakekî. Di vê demê de, lêanîna van nerîtan girîng e jibo parastina endamên saxlem a civakê.
- Axaftina bi rêberên olî û dixtorên kevneşopî yên di civata we de dê ji bo sererastkirina bertekên olî û duayan girîng be. Bi rêberên xwe yên olî ra nîqaş bikin:
 - Agahîya di der barê COVID-19 de dizanin. Heke hewce dike, hûn dikarin çavkaniyên din ên iACT parve bikin.
 - Gava ku 2 metre jêbidûrbûna her mirovê dibe dabaşa axaftinê, em dê çawa bikaribin îbadetên xwe yên rojane û hefteyî pêk bînin? Pêşniyaran bi hev re biafirînin û bipirsin ka hûn dê çawa bikaribin piştgirî li hewlên wan bikin.
 - Em dê bêyî lihevkomkirina fîzîkî ya civatê çawa bikaribin rêûresmê binaxkirina hevalên û malbatên xwe bînin cîh? Em dikarin kîjan rêûresmên bijêre yên her kesî diparêzin biafirînin?
- Heke di civata we de pir ol hebin, serokên baweriyên cuda yên (fermî û nefermî) olên cuda ji bo civînek bînin cem hev da ku ew bikaribin li dora van biryarên girîng danûstendinek hev-bawerî biaxifin. Di dema civînê de, ji bîr mekin ku 2 metre ji hev dûr bimînin û dev û pozê xwe pê maskek, libasek an jî şelpeyek bigirin.

Peyamên Girîng ên ji Serokên me yên Olî yên li der û dorê Cîhanê:

"Paşvexistina îbadetên komdarî yên di mizgeftan de û hemû çalakîyên olî yên kesane ku tîrî pîrsgirêkek pêwîst ya ku di ronahîya hemû armancên Xwedayê de ye î û ew ne tenê gunehek e ya gunehtir ew e ku hûn van lidarxistinên red bikin û yekî û yên din biavêjin xetereyê. Ji armancên bingehîn ên î'ahara î'ah parastina jiyane ye; û ev qedexa ne qedexekirina dûaya rastîn e (ku ew ji bo kesek erkekek takekesî ye), lê li ser duaya civatê (ya ku li gorî pîrrianiya zanyaran ne berpîrsiyariyek kesane ye, û dikare ji ber gelek sedeman were rakirin, tevî hindikbûnê. tûnebûnê). Heta pişporên bijîşk hîlanîna wê nepêjîrînin pêdivî ye ku ev paşvexistin berdewam bike. Ev pîrsgirêkek e ku ne rayedarên olî lê pişporên bijîşkî li ser binirxînin."

- Fiqîha Civaka Amerîkaya Bakur

"Nivîsvana giştî ji CDC [Civaka Dêrên Cîhanê-World Council of Churches] Reverand Dr. Olav Fykse Tveit û moderatorê ji Komîtîya Navendî ya CDC Dr. Agnes Abuom bang li gel û dêr kir ku girîngiya herî bilind bidin "kirina her tiştê ku em bikin ji bo parastina jiyane" û "ji dêrê xwastin ku karûbarên gelemperî pêk neyînin... ji ber ku ev dikare bibe navendên veguhastina vîrûsê" û şopandina hiş û rêzîknameyên ji rayedaran re li gorî rêberên Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê bişopînin." - Civaka Dêrên Cîhanê (CDC)

"Divê em bînin bîra xwe ku tu kes ji êş û azaran azade nîne û divê em destên xwe dirêjî kesên din ên ku di malên xwe de asê bûn, çavkaniyan an jî malbatan bikin da ku wan biparêzin. Ev qeyrana nîşanê me dide ku em ji hevûdu ne cuda ne - qender di demên ku em ji hev dûr dijîn de jî. Ji ber vê yekê, em hemû bi hev bîr û alîkar bûna bi hev re berpîrsiyar in. [...] Ez bi dilsoz hêvî dikim ku her kes bikaribe ewle bimîne û aram bimîne. Di vê dema nediyar de, girîng e ku em di hewildanên afirîner de ku pîr pîr tîne çêkirin hêvî û bawerî wînda nekin." - Dalai Lama

"Yek tiliyek felqê nagire, Metelokek Afrîkî wisa dibêje. Werin em bibin yek ku vê qirêjîya qirêj bi encamên wê yên nebaş derxe derveyî welat û derûdora me [...] [ew] encamên zirarê dide tenduristî, sosyo-aborî, çandî û stên giyanî." - Cardinal Philippe Nakellentuba Ouédraogo, Serokê Sempozyûma Konferansên Epîkopal ên Afrîka û Madagascar.